ÇÎROKÊN KLASÎK ÊN ZAROKAN

PÎNOKYO

BEŞA DUYEMÎN

Hebû carek ji caran, xêr û xweşî bibarin li hazir guhdaran...

Di beşa yekemîn de, Pînokyo carek bi saya cesareta xwe, carek jî bi saya periya qenc ji mirinê xelas dibe, û zêrên wî, dawiyê ji aliyê rovî û pisîkê dilxirab ve tên dizîn. Îca ew piştî ewqas serpêhatiyan, bi xemgînî vedigere mala xwe, cem Gepeto. Em binêrin di vê beşê de hê çi wê werin serê Pînokyoyê me yê saf.

Piştî ku Pînokyo vedigere malê, dora rojê dest bi dibistanê dike û bi hefteyan dibe şagirtekî pir jîr û jêhatî li dibistanê. Lê rojekê, hevalekî wî yê dibistanê, yê bi navê Karlo, ji Pînokyo re dibêje:

--Êvarê, ez ê tevî hevalên xwe herim Welatê Pêlîstokan. Li wê derê em dikarin li gorî dilê xwe bilîzin, paste û şekiran bixwin, û li wir dibistan jî tune!

Pînokyo dibêje:

--Ez ji te bawer nakim!

Karlo dibêje:

--Wê çaxê nîvê şevê, were li goşeya kolanê bisekine û li min temaşe bike !

Tam nîvê şevê, Pînokyo bi dizîka ji malê derdikeve û diçe dîtina Karlo. Zêde derbas nabe, faytonek tijî zarok derdikeve tê û zarok bi qîrîn gazî Pînokyo û Karlo dikin:

--Haydê hûn jî bi me re werin Welatê Pêlîstokan.

Karlo li faytonê siwar dibe û destê xwe dirêjî Pînokyo dike, ji bo ku ew jî siwar bibe. Pînokyo pêşî dudilî dike, lê piştre sozên ku dabûn bavê xwe û periyê, dîsa ji bîra wî diçin û ew li faytonê siwar dibe.

Lê çi ecêbî ye ku heşt kerên ku botên spî di piyên wan de ne, faytona zarokan dikişînin. Pînokyo meraq dike, serê xwe ji paceyê derdixe ji bo ku li wan baştir binêre, û dibîne ku yek ji wan keran bi herdu çavan rondikan dibarîne.

Pînokyo ji ajokarê faytonê dipirse:

--Ev ker çima digirî?

Ajokar dibêje:

--Ew heywanekî ehmeq e, kurê min, tu lê nenêre. Ji ber ku tu li vir kêfê dikî û ew jî dixebite, îca ew ji ber hesûdiya xwe digirî.

Dema ku fayton digihîje Welatê Pêlîstokan, Pînokyo û Karlo dinêrin ku hey lo lo, ew der cihekî wisa delal e ku mirov nikare di xeyala xwe de jî tiştekî wisa bibîne.

Li wê derê cure cure lîstik û pêlîstok hene: Hespik û çember, top û balon, hêlekan û geredolab, û gelek tiştên din... Bi sedan zarok li wê derê virde wirde baz didin û dilê wan çawa bixwaze dilîzin.

Karlo ji Pînokyo re dibêje:

--Divê em li vê dere peyva dibistanê qet neynin ziman, heke na, ew ê me ji vir biqewirînin ha!

Pînokyo bi kêf dibêje:

--Temam baş e! De haydê em ji xwe re bilîzin !

Pînokyo û Karlo, bi qasî du hefteyan li gorî dilê xwe dilîzin, û hetta Karlo êdî serê xwe jî qet naşo û gemarî dibe.

Lê belê rojekê Pînokyo ji xew şiyar dibe û ferq dike ku rûyê wî tev bi pirç bûye. Ew diçe li ber neynikê disekine, îca çi bibîne baş e! Dibîne ku du guhên keran di serê wî de derketine. Ew bi lezûbez baz dide cem Karlo, dibîne ku Karlo jî di eynî halî de ye.

Demekê herdu zîq li rûyê hev dinêrin, piştre jî bi halê xwe dikenin û dikenin.

Karlo bi carekê disekine û qîr dike dibêje:

--Halê me pir komîk e Pînokyo, lê, lê, ez nikarim pişta xwe rast bikim ! Hawar!

Lê belê halê Pînokyo ji yê wî ne baştir e. Îca herdu heval di demeke pir kurt de, bi temamî vediguherin û dibin ker.

Pînokyo û Karlo ji ber xemgîniyê dest bi giriyê dikin, lê belê girîna wan jî mîna zirîna keran e.

Îca ajovanê faytona zarokan pir bi kêf tê cem wan û ew Karlo difiroşe cotkarekî, Pînokyo jî dide hevalekî xwe yê rêvebirê sîrkê.

Pînokyo ji aliyê antrenorê sîrkê ve heta ku hal pê re namîne, her roj tê perwerdekirin, ji bo ku Pînokyoyê ker karibe xwe di çembera agir re derbas bike. Lê dema ku Pînokyo pir diweste û nikare rabe ser xwe, antrenor dikeve ser wî, têra xwe li wî dide.

Rojekê, dema Pînokyo dîsa xwe di çember re derbas dike, dikeve erdê û piyekî wî dişike. Îca ji ber ku ew êdî nikare di çember re derbas bibe, rêvebirê sîrkê wî difiroşe mirovekî din.

Xwediyê nû yê Pînokyo benekî bi stûyê wî girê dide û wî dibe keviya deryayê. Pînokyoyê feqîr heta ber deryayê digirî, lê mêrik wî bernade, û dema ku digihîjin keviyê jî, ew wî daf dide nava avê ji bo ku Pînokyoyê ker bixeniqe û ji çermê wî daholekê çêke.

Pînokyo di nav avê de bi hemû hêza xwe hewl dide xwe, soberî dike, û tevî ku dizane jî ne layiqî alîkariya periya delal e, lê careke din gazî periyê dike.

Dema ku perî hawara wî dibihîze, zûzûka sihirekê çêdike û Pînokyo di cih de dîsa dibe kûklayekî ji text.

Îca dema mêrik ben dikişîne, dibîne ku li şûna ker, kûklayek bi benê wî ve girêdayî ye. Îca ew pir aciz dibe û ji Pînokyo re dibêje:

--Min ji bo çermê te bîst zêr xerc kirin. Lê madem tu bûyî text, ez ê te wek êzingekî bifiroşim!

Pînokyo fam dike ku nikare xwe zûbizû ji destê wî xilas bike, îca ew xwe dîsa diavêje deryayê û heta ku karibe, soberî dike û pir dûr dikeve. Piştî demekê, pêlên deryayê wisa bilind dibin ku Pînokyo nabîne ku balînayeke pir mezin ber bi wî ve tê.

Pînokyo bi carekê ferq dike ku ew ber bi devê wê masiya mezin ve diçe û dikeve devê wê. Ha wê çaxê masiya qerase, yanî balîna, devê xwe digire û Pînokyo dikeve zikê wê.

Zikê balînayê jî wisa mezin e ku Pînokyo dibêje qey ew di nav şikefteke mezin de ye. Îca di zikê balînayê de text û hesin û ben jî hene. Hûn nabêjin ew hemû bermahiyên keştiyekê ne ku balînayê hê nû ew daqurtandiye.

Bi carekê Pînokyo ferq dike ku li aliyê dûvê balînayê ronahiyeke biçûk dibiriqe. Ew xwe nêzî wir dike û dibîne ku bavê wî Gepeto li maseyekê rûniştiye, tiştekî dinivîse.

Kêfa Pînokyo gelek tê û bi qîrîn dibêje:

--Bavo ! Tu li vê derê çi dikî?

Gepeto ji çavên xwe bawer nake û bi qîrîn dibêje:

--Kurê min ! Bi rastî jî tu yî ?

Pînokyo bi girîn xwe diavêje hembêza Gepeto û dibêje:

--Ez ê hew ji te veqetim bavo!... Lê belê çi bû, çi qewimî ku tu hatiyî vê derê ?

Îca Gepeto meseleya xwe vedibêje:

--Piştî ku tu ji malê çûyî, ez li her derê, li te geriyam. Keştiya ku ez lê siwar bûbûm, ji ber bagerekê qelibî û min xwe di zikê vê balînayê de dît. Şensê min hebû ku wê ji keştiyê jî hin tişt daqurtandibûn, bi saya wan min karî zikê xwe têr bikim û binivîsim.

Pînokyo dibêje:

--Divê em ji vir derkevin, bavo ! Haydê em herin heta ber devê masiyê, piştî ku wê devê xwe vekir, em ê xwe biavêjin derve.

Lê belê Gepeto dibêje:

-- Tu here xwe xilas bike, kurê min, min li vir bihêle! Ez nizanim soberî bikim !

Pînokyo qebûl nake û dibêje:

--Ez ê te bigirim pişta xwe bavo! Meraq neke, haydê were!

Îca ew herdu diçin ber devê balînayê û li ber diranên wê disekinin. Dema balîna devê xwe vedike, Pînokyo bavê xwe digire pişta xwe û xwe wisa diavêje derve, nava avê.

Tevî ku Pînokyo pir diweste, lê heta keviya deryayê ew bavê xwe ji pişta xwe danaxe. Gepeto jî wisa westiyaye, cemidiye û birçî bûye ku feqîro nikare rabe ser xwe.

Pînokyo wî bi zorê dibe malê û wî dixe nav cihan. Lê mixabin li malê tu tişt tuneye ku ew bixwin.

Pînokyo radibe diçe cem cotkarekî û jê karekî dixwaze. Cotkar wî digire kar, lê belê ew ê di şûna kerê xwe de wî bixebitîne. Çimkî piyekî kerê cotkar şikestiye û ew dikule, êdî nikare bixebite.

Pînokyo ji serê sibê heta nîvro, çerxa aş digerîne da ku geniman bihêrîne. Her roj piştî kar, cotkar şîrê teze dide wî û ew jî qedehek şîr germ dike, dide bavê xwe Gepeto.

Piştî nîvro jî, Pînokyo li cem Gepeto rûdine, selikan çêdike, piştre jî wan li bazaran difiroşe. Bi wî pereyî jî diçe ji bo bavê xwe xwarinê distîne.

Pînokyo her carê ji Gepeto dipirse:

--Tu xwe baştir hîs dikî bavo?

Gepeto bi dilxweşî bersivê didê:

--Erê kurê min, spas dikim. Ez xwe pir baş hîs dikim.

Rojekê, bazê qesra periyê tê, bi xemgînî ji Pînokyo re dibêje ku perî gelek nexweş ketiye û pereyê wê tuneye ku ji xwe re dermanan bikire.

Pînokyo ji baz re dibêje:

--Meraq neke, bazê delal ! Ez ê aliyê wê bikim. Min hinek pere ji bo rojên teng danîbûn aliyekî. Ha ji te re van pereyan jê re bibe û heta ku ew tam rehet bibe, rabe ser xwe, ez ê her roj ji bo wê pereyan bidim te.

Baz wan pereyan digire û difire diçe cem periyê...

Pînokyo êdî ji berê zûtir ji xew radibe diçe cem cotkar, karê xwe dike, heta nîvê şevê jî selikan çêdike. Tevî ku ew gelek diweste, lê dîsa jî ew pir kêfxweş e, ji ber ku bi vî rengî dikare alîkariyê bide wan kesên ku berê aliyê wî kiribûn. Pînokyo ha wisa her roj ji periyê re pere dişîne û hay ji bavê xwe dimîne.

Şevekê, dema ku Pînokyo raketiye, di xewna xwe de periya qenc dibîne. Perî bi hêdîka ji Pînokyo re dibêje:

--Kurê min ê delal, ez niha gelek baş im. Ez hatim qenciya te bi xelat bikim.

Piştî wan gotinan perî winda dibe.

Dema ku Pînokyo ji xew radibe, di xwe de ecêbiyek ferq dike. Ew diçe di neynikê de li xwe dinêre û dibîne ku ew bûye zarokekî zindî, zarokekî rastîn. Û pozê wî jî piçûçik û delal bûye.

Îca Pînokyo bi dilxweşî dibeze cem bavê xwe, dibêje:

--Bavo, ka li min binêre ! Ez bûme kurekî rastîn.

Tiştê ecêb ew e ku Gepeto jî wê şevê guheriye. Ew bîst sal ciwantir bûye û bûye mêrekî xurt. Îca Gepeto Pînokyo digire hembêza xwe û dibêje:

--Kurê min ê delal ! Tu dibînî hewldanên te hatine bixelatkirin.

Pînokyoyê rastîn dibêje:

--Lê ka ew Pînokyoyê ji text çû ku derê bavo?

Îca Pînokyo û Gepeto dinêrin ku Pînokyoyê ji text li goşeyekê, li ser kursiyekê rûniştiye.

Pînokyoyê rastîn ji xwe re dibêje:

--Ez çiqas bêaqil bûm berê ! Lê ez niha pir kêfxweş im, ji ber ku ez kurê mirovekî ewqas qenc im.

Û Gepeto û Pînokyo jiyaneke dirêj û xweş bi hev re derbas dikin.

Çîroka me qediya, xêr û xweşî li hazir û guhdaran bariya.